Enqere naxwaze li dijî hikumeta Kurdistanê be

Berhevkirin: Rojhat Hacî

Tirkiya hemberî tengaviyeke temam bûye ka çawa wê serederiyê bi kurdên iraqê re bike. Eşkera ye bo demeke dirêje serkirdên Tirkan bi hebûna hikumeta kurdistanê wek parçeyek ji sîstemê federaliya Iraqê razî nedibû. Kurdên Iraqê li sala 1991-ê dest bi rêvebirina kargêriya xwe li her sê parêzgehên Duhok, Hewlêr, Silêmanî kirin û li gel destûrê nûyê Iraqê ev çende bûye dorhêlek û şerîyeta xwe wergirt.

Di vî biyavî de serkirdên kurd li Iraqê cihên bi çalak bi karîger di pirosa siyasî ya Iraqê de wergirtine. Niho jî postên bilind di destan de ne. weku postê serokatiya komarê û cêgirê serok wezîran, zêdeyî van di warê leşkerî, serbazî û îdarî jî de kurdan rolek mezin di meydana siyasî û îdariya Iraqê de heye. Niho kurd bûyine rastiyek û kes nikar e wan mandel bike. Her çawa be serkirdên Tirk danpêdanê bi vê rastiyê nakin. Lewra hemberî kawdanan aloz dibin.

Kêşeya kerkûk û pkk ê ku tirk bi behaneya hindê maytêkirinê di rewşa iraq û kurdistanê de dikin. Lê belê ev kêşe bi vî awayê hişk nahêt çareserkirin heger ew bi şêweyekî êkser serederiyê di gel serkirdên kurd

nekin û rastiya heyî werbigirin ku kurd îro di rojhelata navîn de rastiyeke herî berçavin.

Tê zanîn ku tirkiye têkeliyên bazirganî li gel iraqê hene ku digehinê 3 miliyar dolaran an ku bi rêja 40%ê ev bazirganiye li kurdistana iraqê dihête kirin. Bi buhayê 1 miliyar dolaran tirkan hevbestên karî li herêma kurdistanê hene. Belê di ser vê re tirk dibêjin çi serederiyên me yên fermî di gel kurdên iraqê nîne.

Ji aliyê xwe ve professor Michael Genter taybetmend li ser doseya iraq, tirk, tirkiye xuya dike ku kurd divê gelek bi hişyarane serederiyên xwe di gel Enqere û Bexda bike. Di dirêjiya gotinên xwe de dibêje: Kerkûk li gel hindê ku kêşeyeke navxweyî ya Iraqê ye lê karîgeriya xwe li ser ewlekariya Iraqê û dewletên cîran heye, tirkiye jî bi mafê xwe dizane bibe rêgir ku rewşa ewlekariyê li deverê nehête têkdan, bi taybet ji hindê ditirse ku rewşa tirkiyê jî têk biçe. Hem ji aliyekê din ve tirkiye ji hindê ditirse ku Kerkûk bikeve di destên kurdan e ku bajarekê bi petrolê dewlemend e,wê bibe harîkar ji bo dewletbûna kurdan, û ev dewlet dê kartêkirinê li ser bakûr kuristanê jî bike û di encam de kurdên tirkiye dê mafên xwe yên rewa bi tundî ji dewleta tirkiyê bixwazin û dê tirkiye tengav bikin ku mafên wan cêbecê bike.

Lê rastiye din heye gava Emerîka ji nava iraqê derbikeve, herêma Kurdistanê dê bi tenê di nava dijminên xwe de bimîne. Lê ji aliyê xwe ve tirkiye jî naxwaze wekî Emerîka bikeve nava iraqê û dîsa aloziyên wê di gel yekîtiya ewrûpayê hene û navê dijminkariyê di gel wan bikem çimkî tirkiye dixwaze biçe nav Yekîtiya Ewrûpa. Her wesa tirkiye çi bahane nînin ku bête nav herêma kurdistanê .

Li vê dawiyê jî serkirdên tirk mişe hevdîtin û civînan dikin jibona çu şaşiyên mezin nekin. Lê niha hemû jî dizanin ev ragehandin û daxwiyaniyên tirkan ji bo perdepêşkirina kêşeyên navxoyî yên tirkiye ne û gefên li ber bayne û xelkê herêma kurdistanê na tirsînin.